# Ronahî
şopdara rastiyê ye

www.ronahi.net/ku/ | Hejmar: 586 | 14-Nîsan- 2019 | Rojnameya Siyasî û Çandî


# “ Emê heya nefesa xwe ya dawî parastina gelê xwe bikin”

**Gaziyên Yekîneyên Parstina Gel YPG'ê serketina dîrokî ya QSD'ê û têk çûna çeteyên DAIŞ'ê pîrozkirin û sozdayîna şopandina riya berwxedanê dan. Gaziyan diyar kirin ku birîndariya wan çavkaniya serbilind bûnê ye.**

*Melek DEMÎRTAŞ*









Gaziyên YPG'ê, yên ku ji bo parstina welat û gelê xwe ji hovî û zilma çetyen bikin, her wiha ji bo jiyanek azad parçeyek ji bedenên xwe dane. Serketina QSD'ê ya li Baxozê ku berîka herîdawî ya çeteyên DAIŞ'ê bû li tevhiya şervan, şehîd, gaziyan û hemû gelên Sûriyê pîroz kirin. Tevî ku di oxira parstina xak û gel de perçeyek ji bedena xwe dane jî, lê dîsa soza berdewamiya têkoşînê dan.

Yek ji wan gaziyên ku di oxira parstin xak û gel de parçeyek ji bedena xwe da, Aram Ibrahîm ji bajarê Qamişlo bi temenê xwe 23 salî ye. Aram bi ermanca parstina gel ji hemû êrîşan, ji destpêka şoreşa Rojava beşdarî nav refên parstinê bûye. Di çeperên herî pêşde hema beşdarî hemû hemleyên li dijî çeteyên DAIŞ'ê, ji Rojava û Bakurê û Rojhiltê Sûriyê bûye. Aram, cara yekemîn di hemleya rizgarkirina Til Temirê de ji mil û destê xwe birîndar bû, lê birîna destê wî giran bû; ji bo wê destê wî jêkirin.

**LI VIR MIN RASTIYA HEVALTÎ Û BIRATIYA GELAN NASKIR**

Aram çîroka beşdarbûna hemle û birîna xwe wiha got: “Di Sibata 2014'an de dema tevlîbûna me ji hemleya Til Temire li gundê Til Hefiyan, ew gundê pêkhateyên Sûriyanî ye. Di encama şerê li dijî çeteyên DAIŞ'ê hevalekî me bi navê Zibêre ji lingê xwe bi giranî birîndar bû nema karîbu tu tevgerê bike. Da ku ew hevalê me yê birîndar nekeve destê çeteyên DAIŞ'ê ez çûm alîkariya wî bikim, lê ez ji hêla sekfanekî çete ji zik û destê xwe birîndar bûm û şûnde hevalekî din alîkarî kir ew jî birîndar bû. Di encamê de 18 şervan birîndar bûn û 4 jî şehîd ketin, di riya berxwedan û ji bo hevlatiyê de ku ev qas hevl birîndar û şehît ketin bi bandor bûm. Min li vir rastiya hevaltî û felsefeya biratiya gelan naskir. Gazîbûna min ya duyemîn jî di hemleya eizgarkirina Reqayê de bû, wê demê Reqa bi zeviyê mayîna dihate bi navkirin; ez jî di encama teqîna meyînê de ji dest û lingê xwe bûm.”

Aram Ibrahîm di axaftina xwe de teqez kir dema ku berxwedana Rêbetî ya di zindana îmraliyê de bi bîrtînin, ew birînên wan dibe çavkaniya serbilindahiyê. Dibe ku şervanên gaziyên YPG û YPJ'ê mîna berê nikaribin şerbikin, lê di milê bîrdozî û bi tecrûbeyên xweyî şer û taktîkî, dikarin şervanên nû perwerde bikin. Ibrahîm wiha axaftina xwe dewam kir: “Bi vî rêbazî em hîn jî ew soza parastina xak û gel dayîn em dewam dikin. Jıber ku temamkirina projeya Netewa Demokrtaîk, bi saya felsefeya Serok Abdullah Ocalan çêbû, ji bo wê jî dîsa em soza şopandina riyên şehîdên ku xak bi xwîna xwe avdane dubare dikin.”

**SERKETİNA HERÎ MEZİN RİZGARKİRİNA EFRÎNE**

Şervanê YPG'ê Aram Ibrahîm serketina QSD'ê ya li dijî çeteyên DAIŞ'ê li hemû şervan, gelê Sûriyê û malbatê Şehîdan pîroz kir û di dawiya axaftina xwe de teqez kir ku serketina mezin dê bi rizgarkirina Efrînê ji dagîrkeriya Tirkî û çeteyên wê be.”

Di heman çarçoveyê de şervanê YPG'ê Newroz Qamişlo bi temenê 30 salî, ji Rebîa heya Kobanê û Mınbic'ê jî beşdarî nav hemleyan bû û di encamê şerê li dijî çeteyên DAIŞ'ê ji çavê xwe bû. Newroz Qamişlo li ser ermanc û hemleyên ku beşdarbû wiha got: “Ji destpêka avakirina YPG'ê bi mebesta ku ez erka li himberî welat û gelê xwe pêk bînim tevlî refên parastinê bûm, her wiha beşdarî gelek hemleyan jî bûm. Di Cotmeha 2013'an li gundê Til Elo, hin gundî bi xayîntî dermanê xewê xistibûn nav xwarinê de; wiha em hatin dorpêçkirin. Lê dîsa jî şevanan li berxwedan, di encamê de 13 şervan şehîd ketin û ez ji çav û milê xwe birîndarbûm, niha bi çavekî me. Piştî ji gazîbûna min, dibe ku zêde beşdarî hemleyan nebûm, lê di milê bîrdozî de xebat dikim ku nih ez li ser akadimiya Ş.xebat ya perwerdeya şerkerî û bîrdozî disekinim.”

Newroz got: “Xwedanê vê xakê emin, ji bo wê jî erka me ya serke ewe ku em parastina xak, gel û destketiyên şehîdên xwe bikin. Ji bo wê jî me dest bi hemleyên tunekirina çeteyên DAIŞ kirin, piştî em gazî bûn hevriyên me ev hemleyana berdewam kirin û li himberî DAIŞ'ê bi berxwedanî serketin. Ew serketin û destketiyên ku hatine kirin di rûpelên dîrokê de bi xwîna şahîdan hate nivîdandin, dê di mejî û xeyalên nifşên nû de her û her bimîne.

Gaziyê YPG'ê Newroz Qamişlo da xuyakirin ku tevî ew gazîne jî, lê li himberî her êrîşê de amedene û wiha axaftina xwe qedand: “ez û gelek şervan bi tevlîbûna nava refên parastinê de, me rastiya azadî û hevaltiyê naskirin.”

## Yekmîn olimpiyadên xwendekarên Qamişlo



Yekîtiya Werzîşê ya Herêma Cizîrê bi alîkariya Komîteya Çalakiyên Rêveberiya Giştî ya Dibistanên kantona Qamişlo re hazirtiyên li darxistina yekemîn Olimpiyadên Werzîşê yên xewndekarên Zanîngha Rojava Qurtuba û dibistanên Qamişlo têne kirin. Ji bo çavdêr û şopandina Olmpiyada werzîşê ya ku cara yemîn li Herêmê Cizîrê tê li datxistin komîteyek hatiye avakirin. Ev komîte ji pêvajoya qeydkiirna navan derbasî pêvajoya perwerde û hazirtî bûye.

Di sala borî de ji hêla projeya “Seda Melab ya Sûriyê El-Emel” bi alîkariya Yekîtiya werzîşê ya Herêma Cizîrê re olmpiyada Werzîşê hate li darxistin. Wê demê Olmpiyad bi rengekî listikên yekane û giştî jî derketin pêş û bi serketî bi dawî bûbû, lê Olimpiyada îsal cûda û yekemîne. Jiber ku vê carê dê olimpiyad li ser asta xwendekaran e be. Dê xwendekarên Zanîngehan û dibistanan bilîzin, ev gav ji bo çalakkirina tevgera werzîş û xwendekaran re gelek girînge. Dê xwendekarên dibistana Navîn û yên Amedehî jî beşdar bibin, heya niha 10 dibstanên xort û 10 jî yên jinan bi giştî 20 dibistan beşdar dibin.

**LÎSTIKÊN KU DI OLMIPIYADÊ DE BÊNE LIDARXISTIN EVIN:**

-Di pêşbirka bazdanê ya 100, 200 û 400 mitrî de her du zayend bilîzin û di pêşbirka 800 û 1500 dê tenê xwendekarên xort bilîzin.

- Her du zayend dê bi lîstikên wekî “Goka hesin, avêtina rim û qursên gilover bilîzin.

Di çarêoveya amedekirina olimpiyadê de, hate payîn ku hijmarek mezin ji lîstikvanan hatine qeydkirin. Wiha komîte ji pêvajoya yekemîn bi dawî bû, dê dest bi pêvajoya perwerde û amedekariyên olimpiyadê bike. Hate diyar kirin ku olimpiyada werzîşê 21'ê Nîsanê li Stadyoma Şehîdên 12'ê Adarê ya li bajarê Qamişlo bê lidraxistin....*Ronahî/Qamişlo*


# Ronahî
şopdara rastiyê ye

/www.ronahi.net/ku | Hejmar : 586 | 14-Nîsan- 2019 | Rojnameya Siyasî û Çandî


## Peymangeha “Tîrêj” ji bo pêşketina mûzîkê dixebite



Ji bo fêrkirina lêdana amûrên mûzîkê peymangeha “Tîrêj” rolek girîng dilîze. Ermanca vekirina peymangehê pêşxistina hunera lêdana mûzîkê ye. Mamosteyên ku ji bo pêşketina mûzîkê karê perweredeyê didine meşandin qala xebatên paymangehê kirin. Ji bo Koma Têl Mûzîk jî ku bi gelek zimanan sitrana dibêje, agahiyên giring dan. *R-7*

# FOZA YÛSIF: DAIŞ NE TENÊ PIRSGIRÊKA ME YE

Endama Koordînasyona Kongreya Star Foza Yûsif diyar kir, DAIŞ hîn jî gefê li dinyayê dixwe û got, “Sûcên wan li vê cografyayê hatin kirin. Ji ber vê yekê divê li vir bên darizandin. Ji bo wê jî şert e ku dadgeheke navneteweyî bê avakirin.”



### ‘DIVÊ JI GELEK ALIYAN VE TÊKOŞÎN BÊ MEŞANDIN‘

Endama Koordînasyona Kongreya Star Foza Yûsif li ser vê nîqaşê axivî û diyar kir, şaş e ku DAIŞ tenê weke pirsgirêkeke leşkerî bê nirxandin û destnîşan kir, divê têkoşîneke berfireh bidome. Foza Yûsif got, nabe ku barê DAIŞ'ê tenê li ser milê gelên Bakur-Rojhilatê Sûriyeyê bê hiştin û diyar kir, ji bo avakirina dadgeheke navneteweyî ya van kesan darizîne divê Neteweyên Yekbûyî, dadgeha ceza ya navneteweyî û hêzên navneteweyî bikevin nava hewldanan.

### ‘HÊ JÎ ŞANEYÊN RAZAYÎ HENE ‘

Foza Yûsif got, “DAIŞ ji aliyê leşkerî ve qediya, lê belê pirsgirêk ne tenê pirsgirêka leşkerî ye. Çawa ku heta niha li dijî DAÎŞ'ê têkoşîn hate meşandin, ji niha û pê ve jî ne tenê ji aliyê leşkerî divê ji gelek aliyan ve têkoşîn bê meşandin.” Foza Yûsif destnîşan kir ku nediyar e wê paşeroja çeteyên DAÎŞ'ê yên sûcên şer kirine û malbatên wan çi be û got, barê herî giran li ser milê gelên Bakur-Rojhilatê Sûriyeyê ye. DAIŞ ne tenê pirsgirêka me ye “*R-5*

## Xelîl: Divê hemû hêzên navneteweyî beşdarî dadgehê bibin




Berpirsê Buroya Têkiliyên Dîplomatîk ê TEV-DEM'ê Aldar Xelîl, diyar kir ku divê hemû hêzên navneteweyî beşdarî darizandina DAIŞ'iyên ku li Dadgeha Rojhilat û Bakurê Sûriye pêk bê bibin. Xelîl, anî ziman ku DAIŞ'ê li dijî hemû mirovahiyê sûc kiriye û wiha got: “Bi taybetî divê Neteweyên Yekbûyî tevlî vê danişînê bibe, di heman demê de divê hemû hiqûqnas û saziyên navneteweyî jî tevlî bibin.” *R-2*

## Bêdengiya Ewropayê wê were şermezarkirin

Tecrîda li ser Ocalan û bêdengiya li bara grevên birçîbûnê bi çalakiyên bi asta cîhanê wê werin şermezarkirin. Têkilî çalakiyê KCDK-E'yê got: ‘’Komîteya Pêşîlêgir a Êşkenceyê (CPT), saziyên Ewropayê û hikûmetên Ewropa bêpirsyarî tevdigerin û bêdeng dimînin. Bi van çalakiyan em dixwazin bang li Konseya Ewropayê û CPT'yê bikin ku werin ser karê xwe û raya giştî berpirsyar bibe. *R-5*

## ‘Divê hêzên dagirker werin derxistin’




Girêdayî destûra Sûriyê û danîna nexşerêya çareseriya aloziya Sûriyê endamê Meclisa Hevserokatiya MSD`ê Hesen Mihemed Elî diyar kir ku heta herêmên Sûriyê di bin dagirkeriya Tirkiyê de bin çareseriya aloziya Sûriyê ne pecan e. Mihemed Elî got: Beriya vedîtina çareseriyê divê dagirkeriya Tirk ji xaka Sûriyê were derxistin, gelê Sûriyê li ser masayekê rûnin û aloziyê nîqaş bikin.” *R-4*

## Jinên Sûdanî bûne pêşngê şoreşa xwe



pêşengtiya jinên Sûdanî ji xwe pêşandana ku ji bo şermezarkirina siyasetên hikumeta El-Beşîr çalakiya nerazîbûnê li darxistibûn û li ser malperên tora civakî jina Sûdanî wek sembola şoreşa Sûdanê dana nîşandan ji bo tevgera Kongira Star jî bûye cihê şanaziyê. berdevka Kongra Star a Rojava Evîn Siwêd diyar kir ku ewê piştgiriya jinên Sûdanî ya ku ji bo civakek demokratîk û azad tê dikoşe, bikin. *R-3*

## ‘Berxwedana Leyla Guven têkbirina faşîzmê ye’



Endama Rêveberiya Komeleya Newroz a li Lubnanê Henan Osman di derbarê berxwedana dîrokî ya çalakiya Leyla Guven û rêhevalên wê de diyar kir ku têkoşîna li dijî tecrîdê têkbirina faşîzmê ye, çalekiya Leyla Guven serketina demê ye û wiha got: “di rêya vê berxwedanê de tevahî cîhanê dît, bê Rêber APO ji bo gelê kurd tê çi wateyê. Berxwedana greva birçîbûnê ji bo aşîtiya tevahî cîhanê ye.” *R-2*

## Li Şengalê gora komî a duwemîn tê vekirin



Li gundê Koço yê Şengalê di 16'ê Adarê de, bi fermî ji aliyê hikûmeta Iraqê, Rêxistina Neteweyên Yekbûyî (NY) û bi amadebûna bi seden Êzidiyan vekirina gorên komî ji aliyê Tîmên Vekirina Gorên Komî ve destpê kir. Bi vê boneyê Tîmên Vekirina Gorên Komî destbi vekirina gora duwem kirin. *R-2*

## Wekîla Fransî bersiv da nêzîkatiya erzan a Çavûşoglu



Di navbera Wekîla Fransî ya Asambleya Parlamenteran a NATO'yê Sonîa Krîmî û Wezîrê Karê Derve yê Tirk Mevlut Çavûşoglû de li ser mijara “qirkirin” ê gengeşe derket. Krîmî bi gotina “kuşpeneyiya bênezaket” nerazîbûn nîşan da û derket. *R-2*

## KNK'ê li dijî tecrîdê bang li CPT û raya giştî kir

Komîteya Mafên Mirovan a Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê (KNK) li ser rewşa dawî ya berxwedana grevên birçîbûnê daxuyaniyeke nivîskî weşand. Di daxuyaniyê de hate xwestin ku tecrîdkirina Ocalan bi dawî bibe û hate gotin, “Her wiha divê daxwazên rewa yên zindaniyên siyasî û çalakgerên di greva birçîbûnê de hemûyan bi cih bên anîn.” *R-5*

**Sûka Erdoxan teng dibe** *R-4*
Ezîz KOYLUOGLU

**Mirina mûriyê bi bask....** *R-5*
Idrîs Henan

# Xelîl: Divê hemû hêzên navneteweyî beşdarî dadgehê bibin

Berpirsê Buroya Têkiliyên Dîplomatîk ê TEV-DEM'ê Aldar Xelîl, diyar kir ku divê hemû hêzên navneteweyî beşdarî darizandina DAIŞ'iyên ku li Dadgeha Rojhilat û Bakurê Sûriye pêk bê bibin. Xelîl, anî ziman ku DAIŞ'ê li dijî hemû mirovahiyê sûc kiriye û wiha got: "Bi taybetî divê Neteweyên Yekbûyî tevlî vê danişînê bibe, di heman demê de divê hemû hiquqnas û saziyên navneteweyî jî tevlî bibin."

Piştî têkbirina DAIŞ'ê ji aliyê hêzên QSD', ve nîqaşên têkildarî darizandina 11 hezar endamên DAIŞ'ê destpêkir û ev nîqaş jî didomin. Têkildarî darizandina endamên DAIŞ'ê Berpirsê Buroya Têkiliyên Dîplomatîk ê TEV-DEM'ê Aldar Xelîl nirxandin kir. Xelîl, anî ziman ku darizandina endamên DAIŞ'ê wê li ser statuya herêmê bandorê çêke."

**DAIŞ'Ê LI CÎHANÊ SÛCÊ MIROVAHIYÊ KIR**

Xelîl, anî ziman ku DAÎŞ'ê li dijî cîhanê sûcê mirovahiyê kiriye û wiha got: "Hemû cîhan bandora wê dizanin. Li Cîhan, Rojhilata Navîn û Sûriye sûcê mirovahiyê kir. "QSD, Nûnerên Şoreşa Rojava û Gelên Bakur û Rojhilatê Sûriye li dijî DAIŞ'ê şerekî pir mezin meşand. Têkoşînek bê hempa meşand. Tu kesî xwe li pêş DAIŞ'ê ranegirt. Her kes teslîmî DAIŞ'ê bû. Tenê hêzên QSD'ê û pêkhateyên wê xwe li pêş DAIŞ'ê ragirt. Gelê me û QSD'ê li dijî DAIŞ'ê şer kir û DAIŞ têk bir. Ji Kobanê dest pê kir û li Baxozê DAIŞ bi dawî kir. Hêza DAIŞ'ê ya eskerî li Baxozê têk bir û tine kir."

**TÊKOŞÎNA LI DIJÎ DAIŞ'Ê WÊ BIDOME**

Xelîl, da zanîn ku têkoşîna wan a li dijî DAIŞ'ê û feraseta wê bidome û wiha lê zêde kir: " Di milê hişmendî, civakî û derûnî de emê li dijî wan têbikoşin. Wê têkoşînek demdirêj bidome. Divê hemû mirovên cihanê li dijî sûcê ku DAİŞ'ê kiriye bertekên xwe bînin ziman û helwesta xwe nîşan bidin. Divê DAIŞ'ê hatine girtin bên darizandin û cezakirin. Divê sûcê kirine yek bi yek bên ronîkirin û cezayê wan bên dayîn. Divê Neteweyên Yekbûyî (NY) û hemû hêzên navneteweyî tev li danişinê bibin. Divê DAIŞ'ê hatine girtin li dadgeha herêmê bên darizandin. DAIŞ'iyên ku me girtine kes wan li welatê xwe naxwaze. Divê em çareyekê ji vê yekê re bibînin. Heta niha em çawa li dijî wan têkoşiyan. Ji bo darizandinawan jî emê wisa têbikoşin. "

Xelîl, herî dawî anî ziman ku bi qasî têkoşîna leşkerî ya li dijî DAIŞ'ê divê tekoşîna hiqûqî jî wisa bi bandor be û wiha bi dawî kir: "Ev tekoşîn û şerê edaletê ye. Divê her kes erka xwe pêk bîne. Ger ku em vê têkoşînê bi hevre bimeşînin emê encamê gelek girîng û serketî bi dest bixin. Di vê



dadgehê de tenê sûcê endamên DAİŞ'ê wê ronî nebe. Di heman demê de wê sûcê hêzên li pişt DAIŞ'ê jî aşkere bibe."

## Guh nedin xwefiroşên faşîzmê



Rûsipiyê ji Şehbayê Elî Mehmûd rêzecivîn û komxebatên serok êl û eşîrên herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê yên "Mecadîme, Cês, Demelxa, Benî Cimîl, Beqqara, Geyar, hemû eşîrên Kurd û tirkmenan" nirxand û ev tişt anî ziman: Piştî dagirkirina herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê û bi teybet Kantona Efrînê, ta ku gelê me helwesta xwe li hemberî dagirkeriyê nîşan bide, civînên redkirina dagirkeriyê li dar ketin. Li ser navê hemû pêkhateyên van herêman rûspî, serok êl û eşîre amade dibin.

Mehmûd balê dikişîne ser girîngiya van civînan û dibêje: Faşîzma Tirk li ser navê êl û eşîrên resen hewl dide dagirkeriya xwe li ser axa Sûriyê meşrû bike. Xwefiroşan bi rêxistin dike û li ser navê gel dide axaftinê. Mehmûd destnîşan dike ku; Civaka Sûriyê civakek exlaqî û polîtîk e. Têkîlî û gerdişên xwe dispêre kevneşopiya jiyana eşîrtiya resen. Ango civakek welatparêz ku dagirkeriyê qebûl nake ye. Tirkiyê vê xisleta gelên Sûriyê baş dizane. Ji lewre bi riya çewisandina navê eşîrên Sûriyê berê xwe dide rêbazên herifandina civakê.


**FAŞÎZM NABE DOST**

Mehmûd bi bîr tîne ku ti carî rejîmên Tirk nebûne dostên gelan û wiha pê de çû: Pêwîste gelên me dîroka dagirkeriya Tirk baş bixwînin. Ji rojên osmaniyan bigire û heya Erdoxanê faşîst were, her li ser bingeha tunebûna gelan xwe anîne vê roja me ya îro. Ji ber vê zanebûna dîrokî lazime hemû gelên di bin nîrê dagirkeriya Tirk de ne serî hildin û axa xwe rizgar bikin.

Elî Ehmed Mehemûd di dawiya nirxandina xwe de teqez kir ku eşîrên Sûriyê wê bi hevgirtina xwe ya li hemberî planên dagirkerî û nûkeriyê axa Sûriyê ji parçebûnê biparêzin û wiha bi dawî kir: Wê gelên me ji bakur ta başûr, ji rojhilat ta rojavayê Sûriyê bi avakirina Sûriyeya demokratîk û nenavendî re xaknîgariya xwe biparêzin. Hevgirtina êl, eşîr, pêkhate, rêol û olên li Sûriyê misogeriya yekgirtiya axa Sûriyê ye. Ji bo jiyaneke azad wê êl û eşîrên Sûriyê di nava têkoşînê de bin….

***Ronahî Şehba***

## 'Berxwedana Leyla Guven têkbirina faşîzmê ye'



Çalakiya greva birçîbûnê ya Hevseroka Kongreya Civaka Demokratîk (KCD) û Parlementera Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) ya Colemêrgê Leyla Guven li dijî tecrîda li ser Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan dabû destpêkirin, di roja 156'an de didome. Têklîdarê mijarê Endama Rêvebiriya Komeleya Newroz a li Lubnanê Henan Osman nirxandin kir û bandora çalakiya Leyla ya li ser tevahî cîhanê şîrove kir.

'Çalakiya Leyla Guven ji bo aşîtiya tevahî cîhanê ye'

Henan wiha dest bi nirxandina xwe kir: "Berxwedana greva birçîbûnê îro careke din berê dîrokê veduguherinê ser qehremaniya jinê. Bi armanca bidawîkirina tecrîdê jiyana çalakvanan ber bi mirinê ve diçe, di rêya vê berxwedanê de tevahî cîhanê dît, bê Rêber APO ji bo gelê kurd tê çi wateyê. Berxwedana greva birçîbûnê ji bo aşîtiya tevahî cîhanê ye."

'Çalakiya Leyla Guven serkeftina demê ye'

Henanê di nava axaftina xwe de qala bandora berxwedana Leyla Guven a li ser jinên cîhanê dike û wiha dawî li axaftinên xwe anî: "Îro Leyla bûye sembola jina azad, her kes di kesayeta Leylayê de şexsê jinê, têkoşîna jinê nas dike. Helbet ev yek jî bandorek erênî li ser tevahî jinan da çêkirin Leyla ne jineke ji rêzê ye. Leyla serkeftina demê ye bi berxwedana xwe faşîzim têk bir. Ji bo dilsoziya bi Leyla Guven û rêhevalên wê re divê em asta berxwedanê xurt bikin. Têkoşîna li dijî tecrîdê têkbirina faşîzmê ye, çalekiya Leyla Guven serkeftina demê ye."….***JINNEWIS***

## Wekîla Fransî bersiv da nêzîkatiya erzan a Çavûşoglu



Piştî ku Serokkomarê Fransayê Emnanûel Macron qirkirina Ermeniyan a 24'ê Nîsana 1915 weke roja bibîranê ya salên komarê qebûl kir li Asambleya Parlamenteran a NATO'yê gengeşeyên tund derket. Biryarnameya têkildarî roja bibîranîna Qirkirina Ermeniyan 11'ê Nîsanê di Rojnameya Fermî de hate weşandin. Li ser vê rayedarên dewleta Tirk rayedarên Fransa û Serokkomar Macron kirin hedef û daxuyanî dan.

Di vekirina Asambleya Parlamenteran a NATO'yê ya li Entalyayê Serokê Meclîa Tirk Mûstafa Şentop îdîa kir ku Fransa dîrokê manîpule dike. Şentop Fransa ji komkujiyên Cezayîr û Rûandayê berpisyar dît.

Wekîla Fransî Sonîa Krîmî axivî û diyar kir ku rexneyên Tirkan şik û guman dît û "versîyona dîrokê ya ji aliyê serfirazan ve hatî nîvîsin" red kir.

Piştre Wezîrê Karê Derve yê Tirk Mevlut Çavûşoglû jî axivî û Fransa û Macron sûcdar kir. Li gorî Çavûşoglû Fransa ne di wê rewşê de ye ku dersê bide Tirkiyeyê.

Li ser gengeşeya çêbûyî wezîra Fransî Sonîa Krîmî û deleqasyona Fransayê bi armanca protestokirinê salon terikand. Krîmî li ser Twîtterê peyamek parve kir û got, "Yê ku dersê bi kuşpeneyiyeke ji nazikî û terbiyê dûr, dide, dema ku yekî mîna Mewlût Çavûşoglu .'' Krîmî heman peyam li ser haştaga #24avril (24 Nîsan) #genocidearmenien jî bi kar anî.

Di qirkirna Ermenan de dewleta Tirk 1,5 milyon Ermen bi rengekî sîstematîk qir kiribû.

## Li Şengalê gora komî a duwemîn tê vekirin



Li Gundê Koço yê Şengalê vekirina duwemîn gora komî ji aliyê Tîma Vekirina Goran ve destpêkir.

Hêjayê gotinê ye ku ji gora yekem 28 rifatên kesan hatibûn derxistin. Hemû rifatên ji gorê hatin destxistin û ji bo lêkolîna DNA'yê rêkiribûn Tiba Edlî ya Bexdayê.

Ji bo ku bên naskirin, ji berî niha ji kesên xizmên wan winda bûne xwîn hatibû girtin.



# *Peymangeha "Tîrêj" ji bo pêşketina mûzîkê dixebite*

Ji bo fêrkirina lêdana amûrên mûzîkê peymangeha "Tîrêj" rolek girîng dilîze. Ermanca vekirina peymangehê pêşxistina hunera lêdana mûzîkê ye. Mamosteyên ku ji bo pêşketina mûzîkê karê perweredeyê didine meşandin qala xebatên paymangehê kirin. Ji bo Koma Têl Mûzîk jî ku bi gelek zimanan sitrana dibêje, agahiyên giring dan.

***Dilîn EHMED***

Li bajarê Qamişlo di 2018'an de peymangeha Tîrêj hat vekirin. Ermanca vekirina peymangehê ewe ku hunera lêdana mûzîkê pêşbikeve. Mamosteyê mûzîkê Hoşeng Hadî jî ku bi salane li vê peymangehê dixebite û niha jî Ji bo fêrkirina lêdana amûrên mûzîkê di peymangeha "Tîrêj" de perwerde dide, li ser giringî û rola mûzîkê di pêşxistina şoreşê de axivî. Mamosteyê mûzîkê Hoşeng Hadî axivî û diyar kir ku divê her kesê xwedî qabilyet ji bo ermanca xwe kar û xebat bide meşandin û got; "Piştî despêkirina şoreşa Rojava karê hunerê pêşket, ji ber ku derfetên gel hîn zêdetir çêbû ku xwe di aliyê hunerî de jî pêşbixînin. Beriya vê şoreşê tu kesî nedikarîbû bigota ez xwedî qabilyetim û divê ez bighêjim ermanca xwe, ji ber ku her kesî ew nedipejirand. Lê piştî şoreşê êdî derfetên her kesek çêbûye ku xwe pêşbixîne."

**DIVÊ MIROV EVÎNDARÊ KARÊ XWE BE**

Hoşeng di berdewamiya axaftina xwe de li ser armanca xwe ji ya ji tevlîbûna karê peymangehê re wiha got; "Ez ji biçûkaniya xwe de aşiqê mûzîkê me ji ber vê yekê ji wê demê de min armanca xwe diyar kir ku ez ne tenê ji bo belgeyê dibistan û peymangeha bigrim dest. Ermanaca min ya sereke ew bû di rêya vê peymangehê karê hunerê pêşbixînim."

Mamosteyê mûzîkê Hoşeng Hadî di dawiya axaftina xwe de daxwaz ji gel kir ku hunera mûzîkê paşguh nekin û got; "Ez hêvî dikim ku di dibistanan de li ser biranşê mûzîkê hîn bêtir bisekinin. Ji ber ku çand û hunera mûzîkê di civakê de girînge."

**JI BO PÊŞXISTINA**







**ŞÊWAZÊN NÛ KOMA TÊL MÛZÎK**

Ji 2017 koma bi navê Têl Mûzîk hatiye avakirin, ev kom ji 13 kesan pêktê, yên ku di komê de cih digrin mamosteyên mûzîkê ne û her wiha dengbêjin jî . li gel komê hemû amûrên mûzîkê yê ku têne bi kar anîn amûrên zindî ne. Mîna tembûrê, keman, qanûn û hwd....Yekemîn komek bi vî rengî li Rojava tê çêkirin. Koma Têl Mûzîk bi zimanê kurdî, soranî, erebî û suryanî sitrana dibêje. Mamosteyê mûzîkê Rêbaz Çolî ku di peymangeha Tîrêj de perwerdê mûzîkê dide û di nav koma Têl Mûzîk de cih digre li ser ermanca komê axivî û diyar kir ku ji bo tiştekî nû li Bakur û Rojhittê Rojava were çêkirin ev kom hatiye avakirin û got; "Destpêkê ev kom ji 2-3 kesan pêkdihat lê piştî derfetên tevlîbûnê çêbûn me ev kom mezintir kir, armanca sereke jî ewe ku em tiştekî nû li Rojava çêbikin. Yekemîn strana me ya bi navê Şevbihêrka Têl beriya demekê li ser gelek qenalên televizyonê hat pêşkêşkirin, ji xwe weke tê dîtin gel ji vê komê kêfxweş bûne. Ji ber ku koma Têl Mêzîk bi hemû zimanan stranên xwe dibêjn." Rêbaz Çolî di dawiya axaftina xwe de anî ziman ku ewê di demên pêşde xebatên komê pêşbixînin û got; "Ji bo pêşketina kar û xebetên mûzîkê me gelek piroje amadekirine. Ji ber ku bandora mûzîkê li ser civekê heye divê em xebatên çand û hunera mûzîkê pêşbixînin ."

## Rastiya edebiyat an jî wêjeyê ( Beşe 2)

Têkiliya edebiyatê bi her tişt û her bûyerê re heye. Mijara edebiyatê însan û jiyan e. Edebiyat her dem dixwaze ku tenêtiya însan, tengasî, evîn, keder, nefret, hemû hest û xeyalên wî; ango însan ji însan re salix bide û pê bide nasîn. Tu cudahiyê nake di navbera gel û mirovan. Dixweze aliyên wan ên baş û nebaş, rind û xirab, rast û şaş; her alî wan dixweze ku derxe holê û pêşkeş bike. Armanca edebiyatê îzahkirina hevpariya qedra ruhên însanan e. Bi hev nasîn û biberhevkirinê ji wan re bibe neynik. Bi van xisletên xwe edebiyat hûnereke gerdûnî ye. Di berhemên edebî de behsa însan, qeleqiya wî, şaşwazîya wî, hebûna wî, mirina wî, hêz û neçaretiya wî, şewqet û dilovaniya wî, hêrs û bêmerhemetiya wî, bêçaretiya wî, piçûkxistina wî, kul û keserên wî yên derûnî tên kirin. Herçiqas leheng û mirovên berhema edebî kesên dewerek belû bin jî, bi alîyên van ên însanî ve temsîlên hemu însanan in. Lewma wêjevanê kurd Mehmet Uzun dibêje ku: "Edebiyat xwedî hêzek jîndar e. Jiyanê watedar dike, nemabûnê dizivirîne geşbûnê, ji berxwedanê re dibe çavkanî. Tirsê dizivirîne cesaretê, yên ketî ra dike, tunebûnê dizivirîne hêviyê ."

Huner û edebiyat divê ji armanca xwe dûrnekevin. Ango tu car nekevin bin bandora doz, bîrdoz, raman û ramyariya kesan û koman. Ew ji bona însaniyetê amada ne. Kengê edebiyat bûye navgîna doz, bîrdoz, raman û ramyariya mirov, ew hatiye dorpeçkirin ku edî ji edebiyatê derketiye. Edebiyatvan ger gora kêfa dilê xwe tevbigere ku bi şêweyek serbixweyî berheman ava bike. Ji bo edebiyatê sinordayin edebiyatê difetisîne. Edebiyat bi kurtayî ji bo mirovahiyê ye û malê mirovahiyê ye. Edebiyatê heta ji kêfxweşî û dilfiraziya dil, ji hêvîya daxwezan hêz girt jîndar dike. Di vê wateyê de di dema herî zor û tengasîyê de dibe mekanê stara mirovan. Bi jîndariya xwe mirov ji bêhêvîtiyê, keserê û fikra tunebûnê azad dike, ruhê wî diarimîne. Lehenga "Çîrşîrokên Hezarûşevekê" ya bi navê Şehrazat bi çîrçîrokên xwe (bi edebiyatê) karîbû hêrs, kîn û dilşikestiya padîşah bizivirîne şewqet, merhemetê û hestên bedew.

Adar Jîyan ji bona edebiyatê wusa dibêje: „Wêje tenê ne derbirîna hunera ku hest û nîgaşên mirov bi gotin û nivîsandinê dide neqişandin e. Wêje, wekî dîn jî çand, huner, ziman û şaristaniya qirnên dîrokî û rê û rêbazên jiyana civakî jî bi mirov dide nasandin."

Edebiyatvan/Wêjevan

Edebiyatvan ew kesên ku kilîta xezneya ziman di destê wan de ye. Ew bi nivîs û gotinan peyîvên di xeyalên xwe de difirin bi rêkûpêk û nîzamî didin berhev, dixemilînin, dinivîsînin, dibêjin û vedibêjin. Bi wan xeyal, raman, derd, kul û keserên xwe tînin ziman. Di vê hewldanê de derûdora xwe îstîfade dikin, tûrê xwe berdidin bin bîra dilên xwe, wan bi tecrûbe, raman, hest, xeyal û hêvîyên xwe cûrecûr dixemilînin û pêşkeş dikin. Edebiyatvan bi uslûbek xweşik behsa însanan dikin, bi awayekî hunerî însan ji însanan re tarîf dikin.

Dema mijar li ser însan û însaniyetê be edebiyatvan xwe, civaka xwe, herema xwe jî vebibêje; ev vegotin gerdûnî û ji bo herkesî ne. Edebiyatvan pirsgirêkên hemu kesên li rûyê erdê mîna pirsgirêkên xwe dibînin û ji bo çareseriya wan hewldidin. Ev hewldana gerdûnî sînor û tuxûbên di dil û mêjiyên mirovan de hatine danîn serûbin



dikin, nêrîn û dîtinên berfireh didin ber wan. Ew êş û jana mirov û mirovatiyê ji xwe re dikin êş û jan, ji bona çareseriya wan tevdigerin. Bi duristkirin û têkuzkirina gotin û vegotinê niyet û mexsedên mirovan zelaltir dibin, baştir û duristir tên fêmkirin. Ev jî bi bêjinga edebiyatê mumkîn in.

Edebiyatvan bi hestyarî û pênkariyeke xurt û hêvîdar dikare pêşt ve biçe û bigihê miradê xwe. Ew bi nêrînek berfireh jiyana civakan dinêre û şirove dike. Di berhemên wî de hestyariyek û dilsoziyek mirovhezî û gerdûnî heye. Ew ji xwendevanên xwe re dibe pêşeng û hişmendar.

Edebiyat him nivîskar û edebiyatvanên dunê digihîne hev, him jî civak û neteweya wan. Piştdayîn û ragihandina edebiyatvanên gerdûnî dikarin aşitî, azadî û hevaltiya gelan xurt bikin. Edebiyatvan bi feraset û hişmendiyê ve girêdayî ye. Ew bi qelema xwe dikare civaka xwe û hemû civakên dunê ji xirabî û gemariyên demê haydar bike û ji wan re rêya însaniyetê salix bide….***didome***

## Huner û estetîk



Hozan seyîdxan

Huner ji rabirduya dîroka însan ve heye,û di xweza yê de di nav jiyanê de wek çalakiyek bi rêgez rû daye.ji ber vê tê gotin ku huner mîna dîroka însan kevnare.û di hemû serdemên mirovatiyê de wek rastiyê hebû ye.Mirovatî ev rastiya bi rê û rêbazên dîtinî û afirandin a berheman pêk aniye.Ji bo pêkanîna vê rastiyê jî bi rêya ramanê û hestan deng,reng,ritim û gelek (sîmgeyan) nîşandekan li ber çav girtine.

Ji yê hunerê diafirînin û berhemên hunerî îcra dikin re hunermend tê gotin. Taybetmendiyên ku hunermend ji mirovên asayî cuda vediqetîne;kesayetiya wî,hêza wî ya afirîner,hêza wî ya xeyalê,hestiyarî bûna wî,têgihiştî bûyîn, zanebûyîn û taybetmendiyên wek sebir û aramîdarin.

Tolstoy dibêje; her eser ango berhemên ku bi rêya raman, xeyal û hest bi serketî hatibe afirandin,jêre huner tê gotin.

Helbet çarçove ya hunerê bi stranek an jî deng tenê ve teng nîne.Tabloyek,wêne û nîgarek,peykerek, helbestek,stranek û romanek her yek ji van eserê hunerê ne.

Divê neyê jibîrkirin,berhema ku bibe eserek hunerê,pêwiste taybet be,resenî be,xwediyê pîvan û nirxên estetîkî be, peyamdar be.(ji bo ragihandin a ramanê û hest)pêwiste xwediyê pîvan û hilgirê nirxên gerdunî be.

Fîlozof A.G. Baumgarten(di salên 1714-1762 an de jiya ye)dibêje estetîk diyardeka serbixwe ye.li gorî Baumgarten estetîk fikra zanyarî ya xweşikbûnê yê.Loma tê gotin xweşikbûyîn bingeha estetîkê ye. Ji hemû (nesne yên)heyokên ku di zihnê mirovan de daxwaz û hestên estetîkî peyda dike,çi di xwezayê de be an jî di berhemek hunerî de be jêre xweşikbûyîn tê gotin.

Xweşikbûyîn jî ji destpêka civakbûyînê ta bi gur û geşbûyîna xweza yê,diyardek(olgu)a rewşa guhertinên sosyolojîk û pisîkolojîk tê.

Mirovayetî di jiyan û rabûrduya xwe de çi tişta pêrgî wê hatiye û jiya ye,dîtiye,bînkiriye tamkiriye wek tiştên xweşik û mekroh pênase kiriye.û di encama famkirin û têgihiştînê de ev her du têgîn,xweşik û mekroh ji hevdû cudakirine û tişta mekroh ji heqîqeta xweşikbûyînê û rastiya hunerê bidur xistine.

Rêber APO dibêje, eger nirxek di çarçoveya rêgezê de rola mekrohî ango xerabiyê nelîze,xweşike.

Ya xweşik dibe jî hunere.Mirovatî li ser va rastiya her dayîm ji bo xwe lêgera xweşikbûyînê kiriye armanc.

Di dîroka civakî de her pêwistiyên jiyanê,civakê û xwezayê herî zêde bi rêka hunerê hatiye ser ziman.Nîşaneya jiyana civakê,nasname û helwesta civakê ya li hemberî xwezayê û xweşikbûnê di çi rewşê de ye pênase dike.Dîse di jiyana civakî de diyardeya ku hest û ramanê bi mirov dide diyarkirin û dibe hêza fêrkirinê huner e.Tê gotin tenê ne di jiyana mirov de,di jiyana hemû zindiyên gerdûnî de bandora hunerê bi awayekî balkêş derdikeve holê.

Estetîk jî bi aliyê xweşikbûnê yê şênber ve girêdayî ye.Loma huner,xweşikbûn û estetîk di cewher de hersê bihev ve girêdayî ne û ji hev nayên qut kirin.

Huner bi rastiya xwe ve çawa ku di dîrokê de bandor li ser zanistên xwezayî û civakî kiriye,di roja me de jî vê bandorê bi heman awayî li ser hemû çalakiyên mirov dike.

Başe eger huner çalakiya hunermend ya herî bi hêz û bi bandore,îro li hemberê guhertin û veguherînên civakî çima bi wê hişmendî ya tê binavkirin nabe bersiv, lawaz û qels dimîne?

Îro hunermend bi kîjan farasetê nêzîkatiyê li estetîkê dike.çiqasî hunerê û berhemên hunerî di hunê û şênber dike?

Hunermend li ser çi esasan hilberîna xwe dike û çiqasî bi afirandina berhemên hunerî nirxên civakê xweşik dikin?

Ji va di sê pirsan jî diyar dibe,îro ji doh pirtir pêdiviya civaka kurd bi hunereke dewlemend ya hatiye estetizekirin û xweşik heye.

# Bi pênûsa xwe berxwedana Gelê Efrînê nivîsand

Mamoste Zozan Mihemed a ku bi pênûsa xwe pirtûk a bi navê 'Efrîn Name' li ser Berxwedana Serdemê nivîsandiye got:"Em ê her berxwedana Gelê Efrînê binivîsin."

*Hesna Muhemed*

Mamoste Zozan Mihemed ji Kantona Efrînê ye û niha li Kantona Şehbayê bi cih bûye. Mamoste Zozan Mihemed a ku bi pênûsa xwe pirtûk a bi navê 'Efrîn Name' li ser Berxwedana Serdemê nivîsandiye derbarê berhema xwe de axivî. Zozanê got:"Berxwedana Serdemê ya ku di dîrokê de deng da dê her bidome."


Zozanê wiha dest bi axaftina xwe kir: "Di dibstanê de di pola dehan de Mamosteya min qebilîyeta min ji nivisandinê re dît û xweset alîkariyê bide min ku ez pêş bikevim. Piştgiriya mamosteya min pir hêz û moral da min. Min gelek pirtûk xwendin û lêkolîn kir."

'Pênûs dermanê min e'

Zozanê diyar kir ku ew tevlî gelek pêşbaziyên li bajarê Şam û Helebê bûye û baweriya mamosteyên wê pir pê hatiye û wiha dom kir:" Min dest bi nivsandina çîrokên zarokan kir û him wêneyên wan jî xêz dikir, paşê min hestên xwe bi hinek helbestan parve kir. Ji ber ku ez kesayetek pir bêdeng im nivîs ji min re derman bû ku ez hestê xwe parve bikim. Pirtûkaxaneya min hebû li Efrînê û min dema xwe bi xwendinê derbas dikir."

'Efrîn name ye'

Zozanê wiha dom kir: "Romana min a yekê bi navê 'Qêrîn di qirikên qetî de difetisin' min nivîsand, li ser êşa ku malbat dibînin ew roman di mihrîcana li Efrînê hat xwendin û gelek jê hat hezkirin. Romana min a duyemîn lê yekem a ku hat çapkirin bi navê 'Efrîn Name' ew jî li ser berxwedana Gelê Efrînê ye. Di berxwedana serdemê de, zilm û êrîşa dewleta tirk min rave kir. Her wiha min behsa berxwedana li dijî dagirkeriyê kiriye. Min xwest bi riya romanekê nameya gelê Efrînê bigihînim cîhanê, yên ku guh û çavên xwe li hember hovîtiya dagirkeriya Tirk girtin e, min xwest bi gotin, peyv û




tîpên ji qêrîna zarokan guh û çavên cîhanê vekim."

'Efrîn wê were rizgarkirin'

Zozan di berdewamiya axaftina xwe de got: "Lehenga min mamosteyek e, bi riya wê min berxwedana 58 rojan nivîsand. Hevalek min di şerê berxwedana serdemê de şehîd bû. Êşên dayîk û zarokan di vê pirtûkê de diyar dibe. Bi alîkarî û piştgiriyên hevalên min ez gihaştim vê astê. Ez dixwazim bi riya vê romanê nameyekê bidim ku Efrîn wê were rizgarkirin."

'Pênûsa me berxwedana gel dinvîse'

Zozanê di dawiyê de wiha got: "Dema vegera Efrînê wê romaneke din li ser berxwedana gel li Şehbayê û rizgar kirina Efrînê were nivîsandin. Pênûsên me her tim berxwedana gel dinivîse, ji ber ku gel bi dîroka xwe tên naskirin, divê her yek berxwedana gelê Efrînê binivîse. Em ê her berxwedana Gelê Efrînê binivîsin." ***JINNEWIS***



## Civak û çand

Peywan ARJÎN

Xwedî derketina li çand û hunerê pir giringe, pêwîste destketiyên ku îro gelê kurd li ser xaka kurdistanê, bi dest xistine ku gelekî giranbuha û mezinin biparêzin, her wiha pêwîste ku nivşên nûhatî li ser van îmkan û derfetên ku bi dest ketine li ser dîrok, çand û hunera kurd a resen perwerde bibin, biparêzin û bidin pêşxistin.
Giringiya çand, huner û ziman di pêkane ya Netewan de gelekî giringe, miletekî ku giringiyê nede çand, huner û zimanê xwe, dê ti caran nikaribe bibe xwedî nasname. çand, huner û ziman ewe ku nasnama milet û netewan li cîhanê dide nasîn.
Dema ku mirov mijara çandê tîne holê, nayê wê wateyê ku çand tenê Stran anjî helbest rêzkirine. çand Zimane, Dîroke, urf û adetên civakî yên miletane.
li ser vê astê miletek bi çand û hunera xweve dibe xwedî nasname. ji bo vê yekê divê ku mirov xwedî derkrtina li çand û hunera xwe ji xwere weke erkeke bingehîn bigre û ziman û çanda xwe biparêze û bide pêşxistin.
Helbet em evîndarê çanda xwene, bi taybetî jî di warê şahî û dawetande bi cil û bergên fliklorî û stran û dîlanên ku ji sed salan ve ta vê roja me hatiye di şahî û dawetan de mîna xalîceyekê li ber çavan têne raxistin. li gelek hermên kurdistanê hêjî şahî û dawet li gorî kevneşopiyê têne li arxistin.
lê mixabin gelê meyi ku îroj li derveyî welat dijîn bi rûdana jiyana modernîta kapîtalîst roj bi roj ji cand û nirxên xwe yên resen bi dûr dikevin. di şahî û dawetan de li şûna Govend û dîlanên gelêrî, dans û slow yên biyanî bi piranî têne bi karanîn, Mînak di çanda kurdan de gelek rengên govend û dîlanên gelerî hene, di her rengê govndan de, mijarên weke Evînî, Nêçîrvanî, Cengewarî, çandinî, û hwd. gelek fîgurên balkêş hene. Beriya ku deriyên derveyi welat li kurdan bêne vekirin, kurdan dawetên xwe li gorî demsalan û li qadan çêdikirin. lê îroj li bajaran û di salonan de şahî û dawetên xwe li dardixin.
Mixabin here zeman were zeman, di salonên moderen de govendên me yên gelêrî jî ji resentiya xwe hate bi dûr xistin, Ev rewşa neyinî û bêyi ku mirov pê bihise rê li ber dejeneraszonê vekir, êdîn stranbêj gotinên stranên xwe fîgour û wan listikên biyanî çêdike evjî bi serê xwe rê ji aloziyan re vedike.
Ji bo mayindekirin û parastina hemû rengên çandê bi taybetî jî govendên gelêrî yên resen divê ku xwedîtî lê bête kirin. ev erkekî herî bingehîne û dikeve ser milê hemû ferdên civakê. Ji xwe hêzên desthilatdar û dagîrker ji bona asîmîlasyon û helandina nirxan çi ji dest tê dikin.
Lewma Rêber APO dibêje"qirkirina çandê qirkirina civakê ye" divê bala gelê kurd li ser çand , ziman , huner û nirxên wîbe û wan baş bi parêzin, ji bo ku gelê kurdjî wekî hemû netewan karibin hebûna xwe nîşan bidin. Pêwîste hemû kurdistanî destûr nedin ku nirxên wan yên resen di navendên çanda kapîtalîst de bêne Dejenerkirin.

## Ji bo kêfxweşiya zarokan kar dike

*Dilîn EHMED*

Mihemed Omer diyar kir ku ji bo kêfê bixe dilê zarokan karê xwe berdewam dike. Welatiyê xwediyê dikana "tamîrkirin" çêkirina biskilêtan Mihemd Oemr yê bi temenê xwe 62 saliye ji bajarê Dirbêsiyê ku ev 40 salê wî karê xwe ji bo kêfxweşiya zarokan dewam dike, diyar kir ku ji hezkirina wî ji biskilêtan wî xwe fêrî tamîrkirina wan kir. Tevî zehmetiyên ku di jiyana Mihemede de derbas dibe, bi sedema karê wî lê ew ji bo zarokan karê xwe dewamdike.

**JI BER HEZKIRINA WÎ JI KAR XWE FÊRKIR**

Mihemd Oemr axivî û diyar kir ku ew ji bo kenê zarokan û kêfxweşiya li ser ruyê wan dema biskilêtê wan tê çêkirin kar dike û got; "Ez ji zaroktiya xwe de ji ajotina biskilêtan hez dikim, ji ber vê yekê dema biskilêtê min xeradibû min bi xwe çêdikir û ji wê demê de ez fêrî çêkirina wan bûm. Dema ez biskilêtên zarokan çêdikim û zarok ji dilê xwe kêfxweş dibe ez jî bi wan re kêfxweş dibim. Tevî ku karê min zêde pêwîstiyê jiyana min peyanake lê ez nikarim kêfê nexim dilê zarokan û karê xwe bisekinînim."

**KENÊ ZAROKAN JI HER TIŞTÎ BUHATIRE**

Mihemd Oemr di dawiya axaftina xwe de diyar kir ku heya ew saxbe wê karê xwe berdewam bike û got; "Ew kenê zarokan dema ez biskilêtê wan çêdikim ji her tiştî buhatire. Ez di karê xwe de rehetiyê dibînim ji ber ku karê min kêfa zarokan tîne, di wê dema ku zarok dikenin zaroktiya min tê bîra min. Ji bo zarokan heye ez saxbibim ji dev karê xwe bernadim."



## projeyên Kampanya yên riyan destpê kir



Bi armanca xweşkirina riyên di nava bajara de Desteya Şaredariyan û Ekolojiyê di sala borî de gelek proje xistibûn pîlansaziya sala 2019'an. Yek ji wan projeyan jî çakkirin û zift kirina rê bûn. Li ser heman mebestê jî Kampaniyên giştî yên girêdayî Desteya Şaredariyan û Ekolojî yên wekî kampanya Sîpan, kampanya Zagros û Mecbela Hesekê dest bi kar û xebatên zift kirina rê ya projeya îsal kirin.

Kampanya Zagros wekî giruba yekemîn bû ku dest bi kar û xebatên çakkirin û zift kirina riya derbasbûna Qamişlo ya ji milê xerbî de kirin.
Proje anjî karê ku kampaniya Zagros ku wekî girûpa yekemîn bike wiha ne:
"Projeyên zift kirina riyên derbsabûna bajaran, çakkirina riyên ne sazkar, riyên giştî û taxan jî zift bikin û projeyên riyên piran jî çêbikin".
Hêjayî bi bîrxistinê ye ku her çar Kampaniya diyar kirin ku li gorî pêwîstî, derfet û rewşên hewayê ewê xebat bikin. Di heman demê de amedene ku di riya şaredariyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê de ji Dêrik heya Serê Kaniyê xebat bikin." ***Ronahî/Qamişlo***

## Kooperatîfa firina Avaşîn bû çareseriya pirsgirêka gel

Şêniyên navçeya Girkê Legê ya kantona Qamişlo û hindek gundên derdorê ji ber kêmbûnan nan bi gilî bûn. Ji ber miqdara nanê ku firina tekane ya navçeyê çêdikir nan têra şêniyan nedikir. Ji ber wê şênî neçar diman ku nanê siyahî bikirin. Ruxmî ku firinên siyahî hewcedariyên şêniyan ji nan peyda dikin, lê ji ber buhabûna nan, barê şêniyan giran dikir. Di însiyatîfekê de ji bo çareserkirina vê pirsgirêkê, Mala Kooperatîfan a navçeya Girkê Legê projeya avakirina firinekê danî. Dê koperetîfê ji malbatên şehîdan ên rewşa aboriyên sînordar re hat vekirin.
Di kooperetîfa firinê de 125 malbatên şehîdan şirîk in.
Firin ji navîna meha Adarê ve dest bi hilberînê kiriye û rojane bi rêjeya 2 ton ard çêdike. Hilberîna firinê barê şêniyan bi awayekî mezin sivik kiriye. Li gorî rayedarên firina Avaşîn, hilberîna firinê pêwîstiyên şêniyên taxên navçeya Girkê Legê tevî 24 gundên girêdayî wê peyda dike. Rayedar tekez dikin ku ew hewl didin firinê berfireh bikin û miqdara hilberînê zêde bikin heta ku pirsgirêka nanê bi temamî çareser bikin….
***ANHA***



# Jinên Sûdanî bûne pêşngê şoreşa xwe

pêşengtiya jinên Sûdanî ji xwe pêşandana ku ji bo şermezarkirina siyasetên hikumeta El-Beşîr çalakiya nerazîbûnê li darxistibûn û li ser malperên tora civakî jina Sûdanî wek sembola şoreşa Sûdanê dana nîşandan ji bo tevgera Kongira Star jî bûye cihê şanaziyê. berdevka Kongra Star a Rojava Evîn Siwêd diyar kir ku ewê piştgiriya jinên Sûdanî ya ku ji bo civakek demokratîk û azad tê dikoşe, bikin.

*Ferîşte NEZÎR*

Ev bi sala ne ku li Sûdanê rêjîma El-Beşîr ya zilimkar, zext li ser gelê xwe dide meşandin. wekî her car jî jin yên herî zêde para xwe ji hişmendiya desthilatdar digrin, ji bo wê jî her tim jin pêşengtiya şoreşa azadî û demokratiyê dikin. Di van rojên dawiyê de jî em şahidiyê ji vê yekê re careke din li welateke din dikin.
Li sûdanê ku bi hezaran Sûdanî li ber avahiya Fermendariya Giştî ya Artêşa Sûdanê ji bo şermezarkirina siyasetên hikumeta El-Beşîr çalakiya nerazîbûnê li darxistin. A ku bala tevahiya azadîxwazên cîhanê kişand jî, ewe ku jinên Sûdanî pêşngitiya xwepêşndanan dikin, li ser malperên tora civakî jina Sûdanî wek sembola şoreşa Sûdanê hate nîşandan.
Berdevka Kongra Star a Rojava Evîn Siwêd û Endama Mala jin a Kantona Qamişlo Nîzam Nûrî Xelîl girêdayî mijarê nerînên xwe anîn ziman û diyar kirin ku ewê piştgiriya jinên Sûdanî ya ku ji bo civakek demokratîk û azad tê dikoşe, bikin. Ji bo wê bangî hemû tevgerên jinan kirin ku piştgiriya xwe bidin jinên Sûdanî.

**EM XWEDÎ TECRÛBEYÊN 7 SALÊN ŞOREŞÊ NE**

Berdevka Kongra Star a Rojava Evîn Siwêd daxuya kirin ku Pêla şoreşa li himberî desthilatdariyê, li Rojhilata Navîn dest pêkir û li seran serî cîhanê belav bû û wiha got: "Bi riya van şoreş û serhildanan re guhertin û veguhertinên dîrokî bi xwe re anîn. Ji bo wê jî nepejirandina





zilam, yek bûnda reng û fetisandina dengê jinê derkete holê. Hemû jin êdî ji bo yek ermancê bi yek hewlestî dadikevin qadan, em wekî Kongra Star xwedî tecrûbeyek 7 salên şoreşa Rojava û Bakurê Sûriyê ne, her wiha beriya wê jî zemîna şoreşa Tevgera Azadiyê ya 40 salî ne. Em bi tecrûbeya xwe ya salan pêşngitî dikin."

Evîn Siwêd anî ziman ku dema şoreşek li deverekê li dardikeve û jin pêşngitiya wê dike dê ew şoreş bighêje ermanca xwe û wiha axaftina xwe dewam kir: "Wek Kongra Star bi daxuyanî û meş piştgiriya jinan dikin, him piştgirî û hem jî tecrûbeyên xwe bi wan re parve dikin. Ev şoreşa Sûdanî ku bi pêşngitiya jin û ciwanên zanîngehan hate dest pêkirin gelek girîn û wate dare, ji ber êdî jin dibêje "Bese ji zilim û desthilatdariyê re".
Berdevka Kongra Star a Rojava Evîn Siwêd di dawî de teqez kir ku ewê heya dawiyê piştgriya jina Sûdanî ya pêşng bikin."

**JİN HER TİM PÊŞNGİTİYA AZADÎ Û DEMOKRATİYÊ DİKE**

Endama Mala jin a Kantona Qamişlo Nîzam Nûrî Xelîl jî diyar kir ku jina kurd di her rewş û bûyeran de, timî pênşengitî û piştgirî dide jinên azadîxwaz û aştîxwaz. Nîzam Nûrî wiha domand: "Ji ber ku sembola jinên Rojava û Bkaurê Sûriyê azadiya jin û civake, piştgiriya hemû jinên cîhanê dikin, bi taybetî jinên mîna Sûdanî yên bi çanda xwe ve girêdayî û daxweza azadî û demokrasiyê dikin."
Nîzam Xelîl di dawî de got: "Her tim jin li himberî hemû cûreyên binpêkirinê disekine û dibe pêşeng. Emê jî di her daxuyanî, meş û semîneran de piştgiriya jinên Sûdanî bikin."



## Piştî her zivistanekê behare

Gulîstan XALID

Hin zagon hene ku ne bi destê mirovan, an jî ne bi hişmendî û ferasetên ku li gora xwe zagonan çêdike hatiye dayîn. Ji wê re dibêjin zagonên xwezayî. Xweza jî, mirov jî nikarin van zagonan bugherînin, jiber ew zagonên ku hebûyîn û xwebûyîna her zindiyek li gorî xweza û taybetmendiyên wê dide jiyankirin, dixe nava herikbariyê de, zindîbûnê û tevgerkirina azad derdixe holê. Ev zagonên ku mutlaqiyetê nas nake û veguhertinan weke pêdiviyên xwezayî qebûl dike. Weke mînak çawa ku di xwezayê de tevgerkirineke li gorî van zagonan heye, yanî piştî her zivistaneke ku çiqas sar, hişk, zor û zehmet be jî ewê behareke hênik, nerim, bi coş û heyecan jî ruxmê wan taybetmendiyên zivistanê bê.
Ev tê wateyê ku xweza jî nikare demdirêj bi hişkî dom bike.
Di diyalektîka têkilî û nakokî de, yanî weke şerê di navbera jiyan û mirinê, başî û nebaşiyê, avakerî û xerakeriyê, reşî û ronahiyê de û her wekî din, em bala xwe bidinê aliyek hestên pozîtîf ava dike, aliyek jî hestên negatîf. Yanî aliyê ku her dem li gel avakeriyê be ew alî bêtir bibandore. Lê ev nayê wê wateyê ku aliyê negatîf jî ne xwedî bandore. Lê bandoreke çawa ev mijara nîqaşê ye.
Di têkiliya di navbera desthilatdara û gelan de jî mirov dibîne ku şereke wiha heye. desthilatdar zexteke negatîf zêdetir li ser derûnî û tevgerkirina mirovan didine çêkirin, lê di aliyê hizir de li hemberî vê zextê îsyan û neqebûlkirinek heye. jiber ku mirov di xwezaya xwe de nerme, ewqes zext, hişkayî nikare rake. Hişkayeke ku tevgera wan asteng bike, xwe îfadekirina wan bandor bike û rê li pêşiya pêşketina wan de bigre. Wê demê isyana mirovan di çarçoveya lêgera ya herî baş, rast, yanî ya pozîtîf xwestin de pêş dikeve. Îja dema ku ev dizîvire têkoşînê, yanî rêxistinbûyîn û kombûyînê hêza ruxandina sistema heyî û li şûna wê avakirina ya ku tê daxwazkirin derdikeve.
Yanî desthilatdar ruxmî hêza wan ya negatîf ( ya ku ditirsîne, zextê ava dike, bê îradebûyînê ferz dike, ewê xwezaya mirov ya ku ji azadiyê hez dike, nerme û koletiyê qebûl nake li hemberî vê yekê derkeve, serî rake û bi ser bixe. Eve xwezaya gel, behara gel, an jî gelan vaye di her serdemeke nu de demsala xwe jiyan dike. Yanî çawa ku behar her dem heye, têkoşîna gelan ya ji bo azadiyê tu car naqede.
Buyerên rojên dawî ku li hin welatên weke sudan û cezayir jî rû didin ev hêza gelan ya ku di aliyê pozîtîf de hev bandor dike û xwe fereh dike. Em jibîr nekin jî ku ev weke şoreşa gelan li rojavayê kurdistanê destpêkiribû, niha jî li her derê bandora vê şoreşê xwe dide der. Rojên xweş li pêşiya me ne, rojên azad, bi behar , bi coş û heyecan li pêşiya me ne. Hîskirina vê tenê me dawetî îsrara têkoşînê dike.

# Jinên Êzidî dixwazin hesab ji DAIŞ'iyan bixwazin

Jinên Êzidî yên ji Baxozê hatin rizgarkirin û yek bi yek zilma DAIŞ'ê vegotin, dixwazin beşdarî darizandina DAIŞ'iyên di destên QSD'ê de bibin û weke şahid bên guhdarkirin.
Hêzên Sûriyeya Demokratîk (QSD) li Dêra Zorê dawî li hembûna fîzîkî ya DAIŞ'ê anî û QSD'ê di operasyona herî dawî ya Baxozê de jî, bi hezaran DAIŞ'î dîl girtin. DAIŞ'iyên ji 54 welatan pêk tên, li girtîgehên cuda yên Bakurê Rojhilatê Sûriyeyê tên girtin. Ji bo darizandina DAIŞ'iyan, tê xwestin ku dadgeha sûcên şer ên navneteweyî bê avakirin. Jinên Êzidî yên herî dawî ji destên DAIŞ'ê hatin rizgarkirin, dixwazin beşdarî dadgehên ji bo darizandina DAIŞ'iyan bên avakirin bibin, weke şahid bên guhdar kirin û hesap ji DAIŞ'iyan bixwazin.
Jina Êzidî ya 22 salî Hûda Hesen a li gundê Baxozê ya girêdayî bajaroka Hecîn a Dêra Zorê ji destê DAIŞ'ê hat rizgarkirin, ji gundê Ramûsî yê dikeve başûrê Şengalê ye û di komkujiya 3'yê Tebaxa 2014'an de li navenda Şengalê dîl dikeve dest DAIŞ'ê.

**BI ZORÊ BI 6 KESAN RE HAT ZEWICANDIN**

Hûda Hesen bi darê zorê bi 6 DAIŞ'iyan re tê zewicandin û wê dibin gelek cih û deverên Iraq û Sûriyeyê. Head Hesen a piştî xilaskirina DAIŞ'ê hat rizgarkirin, wiha behsa rewşa xwe dike: "Dema DAIŞ hat hêzên li wê derê em hiştin û çûn. Em Êzîdî bi tenê hiştin. Hemû jin û zilamên ketin pêşiya wan kon kirin. Jin û zilam ji hev cuda kirin û birin cihên cuda. Jin û zarok birin Mûsilê. Wan jî di got 'Me hemû zilam kuştin. Jin jî weke koleyan ji bo me helalin.' Bi darê zorê zarok kirin misilman, di perwerdeyên ol û leşkerî re derbas kirin. Em jî bi zorê kirin misilman."

**SÛKA SEBAYA..**

Hûda Hesen, diyar kir ku li Mûsilê 2 salan ma û wiha axivî: "Ez firotim amîrêkê DAIŞ'iyan. Ez bajar bi bajar gerandim. Li Musilê, dest pê kê ez bi amîrekê re dam zewicandin. Dûre ez birim Reqeyê û li wê derê jî bi amîrekê re dam zewicandin. We demê li Qada El Neîm bazarek hebû. Jê re digotin 'Sûka Sebaya.' Jinên Êzidî li wê sûkê difortin. Ez jî li wê derê firotim kesek din. Bi vî awayî ez bi 5 kesan re dam zewicandin. Dûre ez birim Bab, Helep, Reqqa, Mînbîc û gelek cihên din."

**ME AZADIYA ŞENGALÊ PÎROZ KIR!**

Hûda Hesen, anî ziman ku piştî demekê êdî hêviyên wê yên bê rizgarkirin nemabûn û wiha got: "Dema em dîlgirtibûn me azaiyd a Şengalê pîroz kir. Wê demê bi 7 jinên Êzidî re em li Mûsilê hespî malekê kirin. Dema Şengal hat rizgarkirin, me ew roj pîroz kir. Di wê malê de heya demekê ji bo me televîzyon serbest kirin. Me bi awayekê veşartî qenalên Kurdît temaşe dikir. Me bi vî awayî zanî ku Şengal hatiye azadkirin. Em pir keyfxweş bûn. Me ji derve çikolate anî û li hev belav kir. Ji ber ku jineke Êzidî ya dinava me de ji wan re got 'Jinên Êzidî Şengal ji we girtin' pir xwe aciz kirin û dest bi lêdana me kirin. Dijûn ji me re gotin."

**'DIVÊ DADGEH BÊN AVAKIRIN Û HEMÛ BÊN DARIZANDIN'**

Hûda Hesen, xwest dadgehek ji bo DAIŞ'iyan bê avakirin û wiha dawî li axaftina xwe anî: "Herî dawî em ji destên wan hatin rizgarkirin. Li Baxozê gelek jin û zarokên Êzidî hatin rizgarkirin. Divê gel û jinên Êzidî zilma DAIŞ'ê tu carî ji bîr nekin. Fermanek mezin bi serê me de anîn. DAIŞ'iyên ev kirin hemû teslîm bûn. Divê hesap ji wan bê pirsîn. Divê bên darizandin. Ger dadgeh bê avakirin, ez dixwazim weke şahid bêm guhdar kirin û beşdarî dadgehê bibim. Divê jinên Êzidî ji wan hesap bipirsin."

**JIYAN A KOÇOLÛ: FERMAN DEWAM DIKE**

Jiyan Xelîl Îbrahîm a 22 salî jî, ji gundê Koço yê rastî êrîşên giran ên DAIŞ'iyan hatibû ye. Îbrahîm a dîl dikeve destê DAIŞ'iyan dest pê kê dibin Mûsilê, ji wir jî dibin Kerkuk, Anbar, Halep, Reqqa û Babê û bi 6 kesan re didin zewicandin. Îbrahîm a li Baxozê ji aliyê hêzên QSD'ê ve hat riz-



garkirin, wiha axivî: "Dest pê kê ez tirsiyam bêjim ez Êzidîme. Ji ber ku ji me re gotibûn 'Ger hûn herin gel wan emê we bikuşin.' Em ditirsiyan. Ji ber vê dema em hatin, di serî de me nasnameya xwe veşart. Piştî ku em li qempê hinek man, me êdî zanî rewş ne wisane. Dûre me got em Êzidîne. Êdî wisan bibû em biyaniyê xwe bibûn. Fermana pêk anîn hîna jî dewam dike."

**'EZ JÎ DIXWAZIM HESAP JI WAN BIPIRSIM'**

Jiyan Xelîl, diyar kir ku gelek êşên mezin hatin serê Êzidiyan û wiha got: "Hemû DAIŞ'iyên komkujî pêk anîn, niha dil girtine. Divê ji b ovan dadgeh bê avakirin. Lazimek ku ev li ber gelan hesap bidin. Divê hemû cîhan vê bibîne. Wan mirov revandin û qetil kirin. Ez jî dixwazim ji wan hesap bipirsim."

# ‘Divê hêzên dagirker werin derxistin’

Girêdayî destûra Sûriyê û danîna nexşerêya çareseriya aloziya Sûriyê endamê Meclisa Hevserokatiya MSD`ê Hesen Mihemed Elî diyar kir ku heta herêmên Sûriyê di bin dagirkeriya Tirkiyê de bin çareseriya aloziya Sûriyê ne pecan e. Mihemed Elî got: Beriya vedîtina çareseriyê divê dagirkeriya Tirk ji xaka Sûriyê were derxistin, gelê Sûriyê li ser masayekê rûnin û aloziyê nîqaş bikin.”


Endamê Meclisa Serokatiya MSD`ê Hesen Mihemed Elî got: “Li gel hebûna hêzên herêmî yên dagirker çareseriya aloziya Sûriyê ne pêkan e. Divê Tirkiyê ji xaka Sûriyê were derxistin, gelê Sûriyê li ser masya diyalogê rûne û aloziyê nîqaş bike.”

Mihemed Elî di destpêka axaftina xwe de got: “MSD wek nûnerê gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê tê dîtin. Nêrînek wê yê diyar ji aloziyê re heye. MSD`ê nexşerêya vedîtina çareseriyek giştî ji aloziya Sûriyê pêşkêşî Rûsyayê kir. Bingeha çareseriyê, diyaloga Sûrî-Sûrî ye. Lê rejîma Sûriyê bi awayekî baş bersîv neda. Ji ber wê divê bi tevahiya pêkhateyên Sûriyê re li ser masayekê rûnin.”

Mihemed Elî wiha domand: “Qebûlkirina aliyê din ê danûstandinê û rêzdariya pêşniyarên wî, dê astengî û zehmetiyên ku temenê aloziyê dirêj kirin kêm bike. Her wiha divê sedemên derketina wê werin analîzkirin, eşkerekirin û li ser masaya diyalogê werin nîqaşkirin. Wê demê dê hemû çareseriyên giştî ji aloziyê dê bên dîtin. Eger berovajî wê pêk hat, dê çareseriyên demkî derkevin holê. Nûnerên hikumetê gelek çareserî pêşkêş kirin, lê negihaştin çareseriyek giştî ji aloziyê re. Sûriye hewcedariya çareseriyek bingehîn û demdirêj e. Divê destûrek nû ji Sûriyê re were dayîn da ku mafên tevahiya pêkhateyên Sûriyê misoger bike û bihêle her pêkhateyek bi zimanê xwe biaxive û fêr bibe. Her wiha divê avakirina partiyan azad be.”

## ‘Li gel hebûna dagirkeriya Tirk çareserî ne pêkan e’

Mihemed Elî diyar kir ku Tirkiyê hinek herêmên Sûriyê dagir kirin e û wiha got: “Heta ku herêmên Sûriyê di bin dagirkeriya Tirkiyê de bin çareseriya aloziya Sûriyê ne pêkan e. Beriya vedîtina çareseriyê divê dagirkeriya Tirk ji xaka Sûriyê were derxistin, gelê Sûriyê li ser masayekê rûnin û aloziyê nîqaş bikin.”

Hesen destnîşan kir ku komxebatên diyaloga Sûrî-Sûrî yên ku MSD organize dike, gelek nêrîn pêşkêş kir dibe ku bibin rêgezên sereke yên destûrê.

Mihemed Elî gotinên xwe wiha bi dawî kir: “Em ê bi gelê Sûriyê re bicivin û em ê hewl bidin kongreyek ji opozîsyona Sûriyê re û tevahiya gelê Sûriyê yên Bakur û Rojhilatê Sûriyê li dar bixin. Ev jî dê piştî lidarxistina gelek hevdîtinan û nîqaşkirina gelek mijarên girêdayî destûra Sûriyê û çareseriya aloziyê dê pêk werin. Piştre em ê berê xwe bidin lidarxistina kongreyek ji opozîsyonê re.”….*ANHA*

# Eşîrên Şehba û Efrînê banga serhildanê kırın

**Îqbal BEDRAN**

Rûspiyên eşîrên Şehba û Efrînê bang li gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê kirin ku li hemberî dagirkeriya faîşzma tirk serî hildin. Rûsipiyan diyar kirin ku QSD hêzeke neteweyî ku ji zarokên gelên bakur û rojhilatê suriye yê pêkhatene û gotin: baweriya me û hêviya me jî herî zêdetir bi QSD heye, encax ew efrîn ji dewleta tirk rizgar bikin.

### EM DAGİRKERİYÊ HEZİM NAKİN

Şêxê Eşîreya Elboxemîs li Şehba û Efrînê Elî Elxemîsî serketina QSD li dijî terora DAIŞ’ê li tevhî gelên sûriyê pîroz kir û got: Serketina mezin wê bi têkbirina dagirkeriyên li ser axa Sûriyê re temam bibe. Elxemîsî di dewama nirxandina xwe de encamên civîna serokên êl û eşîrên Bakurê Sûriyê de ev tişt jî anî ziman: “Gelê Sûriyê yek e. Tu carî hezim nake ku axa wî di bin tu dagirkirî de bimîne. Ji aliyên navneteweyî em dixwazin ku çavên xwe li ser vê dagirkeriyê negirin. Êdî kuştina vî gelî bese”. Elxemîsî îşaret bi rola QSD û MSD di çareseriya aloziya Sûriyê de kir û got: “Ancax aloziya Sûriyê bi destê pêkhateyên Sûriyê bê çareserkirin. Hêzên QSD hêzeke demokratîk û zarokên vî gelî ne. Kilîta çareseriya guncaw di destê wê de ye. Pêwîste rêjîma Sûriyê têbigihêje û helwestên xwe biguhere.” Şêxê Eşîra Elboxemîs Elxemîsî di dawiyê de ev bang kir: “Pêwîste gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ku di bin nîrê dagireriya faşîzma Tirk de ne, li dijî dagirkeriyê serî hildin. Hemû êl, eşîr û qiwatên QSD li kêleka wan in.”

### JÎ CERABLUS TA EFRÎNÊ SERÎ HİLDİN

Ji aliyê xwe ve rûspiyê herêma Efrînê Welîd Gubarî di destpêka axaftina xwe de serketina Hêzên QSD li dijî çeteyên DAIŞ pîroz kir û bang li civaka navneteweyî



kir ku derhal li dijî dagirkeriya Tirk ji axa Sûriyê re bisekine û ev tişt anî ziman: Gerek hemû alî fêm bikin ku çareseriya aloziya vî welatî bi destê gelê wê ye. Pêwîste aliyên derve tiliya xwe ji Sûriyê bikêşin. Gubarî her wiha bang li welatên nola Misir û Seûdî Erebistanê kir ku destek bidin têkoşîna QSD ya rizgarkirina axa Sûriyê. Gubarî îşaret bi danûstandinên sûrî sûrî kir û ev tişt li gotinên xwe zêde kir: Aloziya Sûriyê tenê bi danûstandina sûrî sûrî re çareser dibe. Di vê derbarê de ji rejîmê tê xwestin ku nêzîkatiyên xwe ji çareseriyê re biguhere. Gubarî di dawiyê de bang li gel kir ku ji Cerablusê heya Efrîn û Idlibê li dijî dagirkeriya tirk serî hildin.

### SÛRİYÊ BEDEN E Û EFRÎN ÇAV E

Rûspiyê eşîrên Şehba Hec Nedîm Elsadiq jî diyar kir: Êl û eşîrên Şehbayê riya têkoşîna li dijî faşîzma tirk hilbijartine. Çawa ku li dijî neviyên Erdoxan DAIŞ bi saya xwîna şehîdên xwe em bi ser ketin, em ê li dijî bavê wan Erdoxan jî bi ser bikevin. Elsadiq kesên bi dagirkeriyê re dixebitin weke xayîn bi nav kirin û got: Ti hêviya me bi van kesan nîne. Xayîn her xayîn e. Hêviya me bi gelê me heye ku lazime li dijî osmancîtiya nûjen serî hilde. Elsadiq di dawiyê de eşkere kir ku ew bi gelê yê li herêmên hatine dagirkirin re di nava têkîliyan de ne û got: Sûriyê beden e û Efrîn çav e. Wê hemû êl û eşîrên Sûriyê heya rizgakirina tevahî axa Sûriyê têbikoşin.

### Jİ BO TÊKBİRİNA DAGİRKERİYÊ HÊVIYA ME QSD’Ê YE

Şêxê Eşîreya Benî Cimîl ê ji Ezazê Ehmed Elşêxo Elşlerîf jî beşdarî civîna êl û eşîrên Şehba û Efrînê bibû. Elşerîf di derbarê siyaseta faşîzma tirk a çewsandina navê êl û eşîran de got: Faşîzma tirk hewl dide dagirkeriya xwe bi riya mirovên xwefiroş rewa bike. Ji xwe li herêmên dagirkirî ti serokên êl û eşîreyan nemane. Kesên li ser navê êl û eşîreyan mane kurtêlxwar û xwefiroşin. Elşerîf dewam dike: Faşîzma tirk li kuderê kesekî diz û beredayî heye li dora xwe kom kirine. Ji ber vê rastiyê em weke êl û eşîreyên Şehba û Efrînê li vir kom bûne ku rastiya kirêt a siyasetên Erdogan eşkere bikin. Elşerîf di dawiyê de got: Em rê nadin ku axa Sûriyê barçe bibe. Wê gelên Sûriyê yên Kurd, Ereb, Tirkmen, Asûr, Çerkez, Dirzî, Elewî û hwd li hemberî van siyasetên faşîzane li ber xwe bidin. Ji bo serxistina têkoşîna gelan tenê bendewariya me ji QSD heye ku hemû axa Bakur û Rojhilatê Sûriyê, di serî de Efrîn û Ezazê rizgar bike.



## Sûka Erdoxan teng dibe

**Ezîz KOYLUOGLÛ**

Bazar û nakokiyên dewleta Tirk ya dagirker û Rûsya li ser Sûriyê derbasî astek din bû. Berî çend rojan yanî di heyştê vê mehê de dîsa serokê Rûsya Vîlademîr Pûtîn û Erdoxan li Mosko hatin cem hev. Ev hevdîtin piştî hilbijartinê xwecehî yên Tirkiyê û bakûrê Kurdistan pêkhatin. Erdoxan’ê ku bûye dîktarorek êdî ji aliyê herkesê tê naskirin û bi Dewleta Bahçelî yê faşîst re xwe tevger dike, hemû stratejiya xwe ya hundir û derve hiştibû piştî hilbijartinan. Niha hilbijartinê Tirkiyê bidawî bûn û îtîfaqa Erdoxan û Bahçelî ya faşîst heta astekê derbeyek giran xwarin. Ji daxuyaniyên Erdoxan yên berî hilbijartinan jî eşkere bibû ku wê him siyaseta xwe ya bi Rûsya re bijî, him bi Dewletê Yekbûyî Emerîka re li gora encamê hilbijartinan diyar bike. Rûsya û DYE jî berî hilbijartinan siyaseta xwe ya li dijî Tirkiya dibin dîktatoriya Erdoxan de qerisandibûn. Her dû dewlet jî li gora hamleyên Erdoxan wê siyaseta xwe diyar dikin.

Erdoxan’ê ku dixwest di hilbijartina de serkeftinek mezin bidest bixe, ji Pûtin û Trump daxwaz kiribû ku zext lê nekin. Ev di heman demê de hevkariya Pûtin û Trump ya ji bo Erdoxan di hilbijartinê xwecehî de bû. Erdoxan bi vê hevkariya derve di hilbijartina de bitaybet li bakurê Kurdistan hemû qanûnê xwe jî binpêkir û wateya hilbijartinan nehişt. Niha jî naxwaze encamê hilbijartina qebûl bike. Ev jî bi siyaseta Rûsya û DYE ya Tirkiyê re têkildar bû. Lê niha hilbijartin temam bûn û him Pûtîn û him jî Trump ji Erdoxanê faşîst dixwaze siyaseta xwe zelal bike. Lê Erdoxan dixwaze ji nakokiyên Rûsya û DYE sûd werbigre û siyaseta xwe li herêmê bidomîne.

Di hevdîtina Erdoxan û Pûtîn ya di 8’ê mehê pêkhat de wekî hemû caran dîsan herdû aliyê mijarê xwe derxistin pêş. Erdoxan xwest nakokiyan bi Rûsya re veşêre û têkiliyên Tirkiyê û Rûsya yên aborî derxe pêş. Pûtîn berovajî wê têkiliyên siyasî û leşkerî kir mijara xwe. Bi taybet mijarên sereke ya Pûtîn têkiliyên stratejîk yên di çarçova S-400, xetên gaza xwezayî, enerjiya atomî Akkûyî û Sûriyê bû. Ev hevdîtin ya piştî hilbijartina berê dewleta Tirk ya dibin dîktatoriya Erdoxan de ber bi kuve ye zêdetir diyar kir.

Erdoxan her diçe zêdetir di navbera Rûsya û Dewletê Yekbûyî Emerîka de asê dimîne. Êdî Emerîka ne tenê di çarçova xwe de diaxife, çarçova xwe firehtir kir û NATO dide axaftin. Ji Erdoxan re dibêje ku wek endamek tevbigere. Lê niyeta Erdoxan ya wek endamek NATO tevbigere nîne. Têkiliyên xwe yên bi Rûsya re hatiye astek ku Tirkiya dibin dîktatoriya Erdoxan de nikare jê vegere. Xuya dibe ku DYE ev ji nêzîk ve dibîne.

Ev hevbeşiya Pûtîn û Erdoxan wê herî zêde li Idlibê bandoriya xwe bike. Erdoxan’ê ku di rastî de dixwest ji Idlibê derkeve û radestî Rûsya bike, 17 Îlona 2018’de peymana Soçî dibin zexta DYE û Ewrûpa bi Rûsya re wajo kir, niha wê çi bike ne diyare. Dibe ku demek nêz de li gora ev peymana Erdoxan bi temamî Idlibê radestî Rûsya û rêjîma Sûriyê bike. Ya jî rê bibe Rûsya, rêjîma Sûriyê û Îran êrîşek bînin ser herêmê. Ev jî tê wateya derbeyeke mezin bi destê Tirkiyê û Rûsya li dijî siyaseta DYE û Ewrûpa dikeve. Xuyaye dewleta Tirk ya dagirker ji niha ve amadekariyê vê dike. Rûsya jî ji vê rewşê kêfxweşe.

Li gora nêzîkbûna Rûsya û Tirkiyê demek pir nêz de dibe ku êrîşa li ser Idlibê destpêbike. Ev hamle ne tenê li dijî Idlib’ê, di heman demê de hemleya Erdoxan û Pûtîn li dijî Dewletê Yekbûyî Emerîka û Ewrûpa ye. Ka em binerin wê hamleya beramber çewa be…



# Foza Yûsif: DAIŞ ne tenê pirsgirêka me ye

Endama Koordînasyona Kongreya Star Foza Yûsif diyar kir, DAIŞ hîn jî gefê li dinyayê dixwe û got, “Sûcên wan li vê cografyayê hatin kirin. Ji ber vê yekê divê li vir bên darizandin. Ji bo wê jî şert e ku dadgeheke navneteweyî bê avakirin.”



Piştî ku Hêzên Sûriyeya Demokratîk (QSD) li bejahiya rojhilatê Dêra Zorê dawî li serweriya DAIŞ’ê ya li ser xaka Sûriyeyê anîn, “Rewşa piştî DAIŞ’ê” bû mijara sereke ya rojevê.

Li gorî daneyên ne fermî, zêdeyî 11 hezar endamên çekdar ên DAIŞ’ê li girtîgehên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ne. Piraniya wan jin û zarok zêdeyî 72 hezar kesên ji malbatên DAIŞ’iyên ji 54 welatên cuda li kampan e.

Ji bo van kesên ji welatên cuda hatin Sûriyeyê û sûcên şer kirin radestî welatên wan bên kirin, Rêveberiya Bakur-Rojhilatê Sûriyeyê beriya niha bang kiribû, lê belê bersiveke erênî nehatibû. Li ser vê yekê mijara darizandina van kesan li Bakur-Rojhilatê Sûriyeyê hate nîqaşkirin.

Endama Koordînasyona Kongreya Star Foza Yûsif li ser vê nîqaşê axivî û diyar kir, şaş e ku DAIŞ tenê weke pirsgirêkeke leşkerî bê nirxandin û destnîşan kir, divê têkoşîneke berfireh bidome.

Foza Yûsif got, nabe ku barê DAIŞ’ê tenê li ser milê gelên Bakur-Rojhilatê Sûriyeyê bê hiştin û diyar kir, ji bo avakirina dadgeheke navneteweyî ya van kesan darizîne divê Neteweyên Yekbûyî, dadgeha ceza ya navneteweyî û hêzên navneteweyî bikevin nava hewldanan.

### ‘DIVÊ JI GELEK ALIYAN VE TÊKOŞÎN BÊ MEŞANDIN‘

Foza Yûsif got, “DAIŞ ji aliyê leşkerî ve qediya, lê belê pirsgirêk ne tenê pirsgirêka leşkerî ye. Çawa ku heta niha li dijî DAÎŞ’ê têkoşîn hate meşandin, ji niha û pê ve jî ne tenê ji aliyê leşkerî divê ji gelek aliyan ve têkoşîn bê meşandin.” Foza Yûsif destnîşan kir ku nediyar e wê paşeroja çeteyên DAÎŞ’ê yên sûcên şer kirine û malbatên wan çi be û got, barê herî giran li ser milê gelên Bakur-Rojhilatê Sûriyeyê ye. Foza Yûsif got, “Em qala bi deh hezaran kesî dikin ku ji çar aliyên dinyayê hatine. Mirov dikarin bêjin, barê tevahiya dinyayê niha li ser milê gelên Bakur-Rojhilatê Sûriyeyê ye.”

### ‘HÊ JÎ ŞANEYÊN RAZAYÎ HENE ‘

Foza Yûsif bi domdarî got ‘’Hê jî şaneyên razayî hene. Li hêla dî ev kes niha li girtîgehan in lê statûyeke vir tine. Li ser herêma me, di serî de dewleta Tirk, hin dever gefê li me dixwin. Heke li herêmê valahiyeke biçûk li ser ewlehiyê çêbibe ev kes ji bo her kesî wê bibin talokeyeke mezin. Wê bibin mîna bombeyeke ku pîma wê hatibe kişandin.’’

### ‘DIVÊ TÊKOŞÎNA HEVPAR BIDOME’

Yûsif li ser Kampa Holê jî got yek ji mezintirîn kampa Rojhilata Navîn e, ev ji bo Bakur-Rohilatê Sûriyê ji hêla aborî, ewlehî û lojîstik ve barekî giran e û got, ‘’Divê rewşa endamên DAÎŞ’ê yên girtî were nirxandin. Lê hewceyî bi xebateke hevpar heye. Divê NY, Rêxistina Efûyê, dadgeha cezayê ya navnetewî û rêxistinên civaka sivîl ên navnetewî bi hev re bixebitin. Divê em hemû bi hev re vî barî hilgirin.’’

### ‘DIVÊ DADGEHEKE NAVNETEWÎ WERE AVAKIRIN’

Endama Koordînasyoan Kongra Star Foz Yûsif herî dawî got DAIŞ ne tenê problema wan e, ya her kesî ye, kesên ku li herêma wan sûc kirine dibe ku li deverên din jî sûc kiribin, lê piranî li herêma wan sûc kirine û domand, ‘’Ji bo vê jî divê li vir werin darizandin. Ji bo vê jî divê dadgeheke navnetewî were avakirin.’’

# KNK’ê li dijî tecrîdê bang li CPT û raya giştî kir

KNK’ê xwest, tecrîd tavilê bi dawî bibe, daxwazên rewa yên çalakgerên di greva birçîbûnê de ne bi cih werin anîn û ji bo vê jî bang li saziyên mafên mirovan, CPT û raya giştî kir. KNK’ê ji çalakgeran jî xwest, dawî li çalakiyên fedayî bîne.

### ‘BILA ÊDÎ ZINDANIYÊN SIYASÎ Û ÇALAKVANÊN KURD DAWÎ LI JIYANA XWE NEYNIN’

KNK’ê bi bîr xist, ku li zindanên cuda yên Tirkiyeyê çend meh in zindaniyên siyasî yên Kurd ji bo bidawîbûna tecrîdkirina Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan di greva birçîbûnê de ne û diyar kir, “Ji 20’ê Sibatê heta niha 7 zindaniyên siyasî yên Kurd ku di nava wan de 4 jin hene, her wiha welatiyekî jî li Elmanyayê ji bo heman meremê dawî li jiyana xwe anîn.”

Di daxuyaniyê de bang li zindaniyan hate kirin ku êdî bi ti awayî dawî li jiyana xwe neynin û ragihand, xwekuştin pirsgirêkan çareser nake, di heman demê de metirsiyên mezin li pey xwe dihêle.

### JI BO BIDAWÎKIRINA TECRÎDÊ BANG LI CPT Û SAZIYÊN NAVNETEWEYÎ HATE KIRIN

Di daxuyaniya Komîteya Mafên Mirovan a KNK’ê de hate xwestin ku tecrîdkirina Ocalan bi dawî bibe û hate gotin, “Her wiha divê daxwazên rewa yên zindaniyên siyasî û çalakgerên di greva birçîbûnê de hemûyan bi cih bên anîn.”

Di dawiya daxuyaniyê de ev bang hate kirin: “Em daxwaz ji rêxistinên mafê mirovan yên Kurdistanî, navdewletî û komîteya qedexekirina êşkenceyê (CPT) dikin, her wiha bang li ragihandin û medyayên Kurdistanî dikin ku hemû bi hev re ji bo bi dest ve anîna daxwaziyên zindaniyên grevgirtîn û hemû çalakvanan û parastina selametiya jiyana wan hemû hewl şiyanên xwe bikar bînin.”

# Bêdengiya Ewropayê wê were şermezarkirin

Li welatên Ewropayê tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û bêdengiya li bara grevên birrçîbûnê ya li dijî tecrîdê bi çalakiyên bêdeng ên ku bi asta cîhanê wê werin kirin wê were şermezarkirin.

Têkilî çalakiyê KCDK-E’yê wiha got:

‘’Komîteya Pêşîlêgir a Êşkenceyê (CPT), saziyên Ewropayê û hikûmetên Ewropa bêpirsyarî tevdigerin û bêdeng dimînin. Bi van çalakiyan em dixwazin bang li Konseya Ewropayê û CPT’yê bikin ku werin ser karê xwe û raya giştî berpirsyar bibe. Li dijî bêdengiya kujer a Ewropayê 13’ê Nîsanê saet 14.00’an li navendên cureber ên cîhanê wê çalakiyên ji mirovên bêdeng çêbibe, em bang li her kesî dikin xwe tevlî çalakiyê bikin.

Navendên ku wê çalakiyên global lê werin kirin; Londra, Parîs, Koln, Hambûrg, Manheîm, Frankfûrt, Hannover, Berlîn, Nurnber, Strasboûrg, Atîna, Stockholm, Kopenhagen, Graz, Toronto, Lîmassol, Lozan, Taoulouse, Amsterdam û Viyana.

Em bang li gelê xwe dikin ku bi rihekî serferber hêzê bidin vê çalakiyê, hemû derfetê xwe bi kar bîne, li her deverê û meydanê çalakiyên hevşibê vê bi hevkariyê geş bikin.’’

## FENER

## Mirina mûriyê bi bask nêz bûye



**Idrîs Henan**

Bi serketina leşkerî ya li dijî terora DAIŞ, qonaxa duyemîn a têkoşîna li hemberî terorîzmê dest pê kir. Ew jî têkoşîna ideolojîk a ziwakirina jêderên hişmendî yên vê terorê ye. Di pêvajoya yekemîn qonaxa berxwedana li dijî hebûna leşkerî ya vê terorê de, bi dijwariya şeran re xuya dibû ku wê duyemîn qonaxa vê têkoşînê ya herî girantir û bi bandortir be. Ji ber ku têkoşîna li dijî terorê bi qasî serketinên fîzîkî bi xwe re aliyê paradîgmatîk jî bi ser xist. Bi gotineke din; rastiya şerê di navbera herdu aliyan de, cewherê hişmendî yê herdu xetên demokratîk û tundrew danî meydanê. Di encamê de, weke heqîqetek dîrokî xeta gelan a demokrasiyê bi ser ket.

Ji bo duyemîn qonaxa vê têkoşînê jî paşxaneya ideolojîk gelekî girîng û encamgir e. Di esas de bingehên serkeftinê xwe dispêrin jêderên ideolojîk û felsefeya jiyana azad a netewa demokratîk. Ango aliyên ruh, moral û baweriyê. Ger pratîka berxwedana li hemberî vê biçimê terorê bê van sincên hişmendî bûya, wê sedî sed ev serketina gewre jî bi dest neketibûya. Wê weke şerê di navbera du aliyên normal yên berhemên zihniyeta çetetî û rêbiriyê bûya. Lê ji ber ku ne wisa ye, herdu alî jî xwedî xet û hişmendiyeke cuda bûn, serketina aliyekî dihat wateya serketina senteza felsefîk û xeta ideolojîk a şiklê pêşeroja vî welatî diyar dike. Tişta ku bi encamên vê serketinê re gelek eşkere bûya, daxwazên gelan ên biratî û jiyana hevbeş e. Ji ber ku ya bi serketiye vîna gelan û îradeya jiyana azad a hevbeş e. Ger ne ji wê vînê bûya, tekez wê ev serketin jî ne pêkan ba. Ancax bi yekîtiya gelan a li ser hîmên biratî, edalet û wekheviyê, encama berxwedana li dijî terora DAIŞ pêkan bûya.

Bi tunebûna fîzîkî ya terora DAIŞ re, jêdera bav, faşîzma Tirkiyê derbeya mirinê xwar. Faşîzma ku bavaniya terora cîhanî dike, bi têkbirina çeteyên DAIŞ re kêliyên xwe yên herî dawî dijî. Encamên hilbijartinên 31 Adara îsal jî rastiya vê girêdana beolojîk a navebera kur û bav de isbat kir. Dema ku law têk çû, qiraltiya bavê li Enqerê hejiya. Di encam de rastiya dîktatoriya li ser dika desthilatdariya li Tirkiyê bi cihanê re hate parvekirin. Daxuyaniyên fermî û nîv fermî, raportên rojnamegeriya cîhanî û rûdêma terazûyên muhtemel vê yekê diyar dikin. Êdî cihana ku heya niha di berdêla berjewendiyên xwe de çav li kiryarên faşîzma Tirk digirt, nikare encamên vê serketina gelan binixumîne. Faktorbûyîna xeta netewa demokratîk a hişmendiya pêşeng bi xwe re rêgez, hîm û xîmên hevsengiyên pêşerojê jî guhartin. Vê yekê tenê bandor li hindirî Tirkiyê ne kir. Bandora serketina paradîgmatîk a gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi xwe re keleheke din a faşîzma Tirk li Afrîqyayê herifiand. Serketina îradeya gelan li Sûdanê carek din isbat dike ku faşîzma Tirk êdî dorpêçkirî ye. Li hemberî vîna resen ti şansê wê yê jiyanê jî nemaye. Ji ber vê yekê jî xwe empozeyî xeta dijberî hevlabendên xwe yên NATO`yê kiriye û li dijî wê bi Rûsyayê re ketiye nava plangeriyan. Bi heman rêbazên berê yên li ser bingeha tunebûna gelan hewl dide ji nû ve ruh bi canê mirî ve berde. Weke mûriyê bi bask bûye û êdî mirina wî nêz bûye tevdigere. Lê tê gotin, dema ku mûrî bi bask dibin mirina wan jî muheqeq dibe.